Hûn bi xêr hatin
Dibistana Frölenbergschule

Agahiyên girîng ji A heta Z yê

Dayik û bavên hêja,

armanca amadekirina vê broşurê (pirtûkok); li dibistana (xwendegeh) me ji bo bicîh kirina zarokên we û hêsankirina jiyanan wan ya dibistanê ye. Di vê broşura piçûk de, li ser jiyana dibistanê ji bo we gelek agahî (pêzanîn) hene.

Navnîşan:	**Frölenbergschule** Schulstr. 29 33647 Bielefeld Tel.: 0521 – 55 799 400 Fax: 0521 – 55 799 4015
Malper:	www.froelenbergschule.de

Têkildar:

Rêveberiya dibistanê:	Daniela Pacyna-Sielemann Jutta Richter
Sekreter:	Petra Giersch
Dergevan:	Dirk Nienhaus
Koma xebatê:	Niha li dibistana me 15 mamoste dersan didin.
Xebatkarên sosyal-ên dibistanê:	Sandra Rauschen, Miriam Kaiser û Christine Hansen

Rêveberiya dibistana tevahiya rojê/berî û piştî nîvroj (OGS û VÜM): Jasmin Breuer

Hejmarê telefonên girîng:

Frölenbergschule: 0521 / 55 799 400

OGS û VÜM: 0521 / 55 73 955

Xebatkara sosyal a dibistanê: 0176 7689 9531 / Sandra.Rauschen@rege-mbh.de (Sandra Rauschen, berpirsiyara daxwaznameyên Perwerde û Tevlêbûnê - BuT)

Saetên Sekreterî vekirî ye: Ji duşem heta, pêncşemê demjimêr/saet ji 9.00 heta 12.30

Ger/seyran: Gerên dibistanê yên rojane an ji bo çend rojan tên çêkirinê parçeyekî perwerdeyê ne. Ji ber vê jî divê/mecbûr zarokên diçin dibistanê biçin wan geran. Bi piranî ger ji bo rojekê tên çêkirin lê ev ger di pola/sinif 3. an 4. an de dikare bibe çend roj. Ev gera şagirtan, beşek ji bernameya/ programa dibistanê ye. Di plankirina çûyina ger/seyranê de heger malbat pêş de dibistanê agahdar bikin, taybetiyên olî (dînî) û yên ji bo xwarinê li ber çavan tên girtin. Ji bo mesrefa gerê, derfetên alîkariya diravî/pere jî heye. Heger pirs û pirsgirêkên we hebin, hûn dikarin bi ewleyî bi mamosteyê polê re têkevin têkiliyê.

Ji dersê azad bûn: Ji bo azadbûna/neçûyina zarokan ya dersê, divê malbat (dê û bav) pêş de vê daxwaza xwe bi nivîskî bidin dibistanê. Di demek nêzîkî berî betlaneyê de destûra neçûnê xwestin ne gengaz/mimkûn e.

Lênerîna zarokan: Li dibistana me bêyî perwerdê, ji bo lênerîna zarokan du derfet hene. Frölenbergschule ji sala 2005 û vir de wek Dibistana Tevahiya Rojê (OGS) saet di 07.30 - 17.00/16.00 - 16.30 an vekirîye. Dîsa ji bo lênerîna zarokan hetanî piştî nîvroj (VÜM) saet ji 7.30 an heta 13.30 ê derfet heye. Agahiyên zêdetir hûn dikarin ji koma me ya xebatê û Buroya Dibistanê bigirin. Ji ber cih bisînor (kêm) e, divê zarok zû bên qeyd bikin.

Dema hevdîtina dê û bavan: Di her sala perwerdeyê de bi dê û bavan re du caran civîn tên çêkirin. Bêyî van jî hewcedarî hebe, her dem hevdîtin dikare bê kirin.

Rawestgeha dê û bavan: Ji sala perwerdeya 2016/17 an û vir ve, li ser rêya dibistanê pişti lambeya trafîkê, dêyek yan jî bavek radiwete û ji vir zarokên xwe dişînîn dibistanê.

Heta zarok derbas dibin, digihêjin dibistanê, dê an bav dipên û çavderiyê ji zarokan re dikin. Ev rewşa trafîkê sivik dike û ji bo bixwebaweriya zarokan dibe alîkarî.

Lêborîn: Heger zarokên we nexweş bin, roja yekê 1. an herî dereng roja dudan 2. bi xwe an jî bi telefonê ji dibistanê re bibêjin da ku bê zanîn ku çima zarok neçûye dibistanê. Piştî agahdarkirina dibistanê divê lêborîn (Entschuldigung) bi nivîskî bê dayin. Heger nexweşî dirêj berdewam bike, piştî 2 (du) hefteyan, di navberê de divê careke din dibistan di derbarê rewşa nexweşiyan zarokan de bê agahdarkirin. Ku nexweşî berî an piştî betlaneyan (Ferien) hebe, li gorî Zagona Dibistanan Xala 43 Benda 2 an divê rapora doktor hebe. Ji bo nexweşiyên ku zarok ji hev dikevin ji kerema xwe bi doktor bişêwirin û li gorî şîreta wan zarokên xwe bişînin dersê an na.

Hevpeymana Perwerdê:

Li dibistana me, divê her kes bi kêfxweşî û heta gengaz/mimkûn be, karibin bêtir tiştan hîn bibin. Ji ber vê sedemê di navbera dê, bav û dibistanê de peymanek/ lihevkirinek hatiye çêkirin. Ev peyman ji aliyê mamosteyên polê de di civîna yekemîn a dê û bavan (Êvara Dê û Bavan) de tê belavkirin û vegotin.

Duçerxe/bisiklêt:

Em wek dibistan, pêşniyar nakin ku zarok bi tenê bi duçerxe/ bisiklêt biçin/bên dibistanê. Ji ber ku zarok, hîn di vî emrî/salî de ne xwedî ezmûn/tecrube ne û rêbazên trafîkê baş nizanin. Zarokên biçûk di ajotina duçerxeyan, şanekên tarfîkê û rênîşên polîsan de xam in û sibehan ji aliyê ewlebûnê de (lez kirin, rewşa baş nedîtinê/dîtbarî, tevgera bi komî **û w**ekî **d**in-**ûwd**.) cuda ne.

Loma jî ajotina wan ya duçerxeyan ne zêde ewle ye. Zarok di pola çaran (4) de perwedeya ajotina duçerxe dibînin. Piştî perwedeyê, ezmûna/îmtîhana duçerxe, bi bi hevkariya polîsan tê çêkirin. Di civîna dayik û bavan de di derheqê naverok û armancên bernameya hînekên duçerxe de agahî tên dayin.
Gelek şagirt/xwendekarên dibistana me bi gilorajok (Roller) tên dibistanê. Divê haja we jê hebe ku zarokên we kumikên/serikên duçerxe (Helm) bidin serê xwe. Ji bo park kirina duçerxe û gilorajokan divê li ba/cem salona werzîş/sporê li cihê duçerxeyan bên park kirin.

Taştê: Navbera taştê 10 deqe ye. Di nava vê demê de zarok û mamoste an mamosteyên polê, bi hev re taştê dikin/dixwin. Divê hûn ji bo zarokên xwe taşteyek baş û bi tenduristî/ bijûn amade bikin. Di nava nan de (wek mînak penêr an rovîk/sosîs) mêwe, sebze û vexwarinek (ne ava bi leymûn, ava safî baştir e.)

Bes bi tenê di hinek rojên taybet, wek partiyên/ pîrozkirinên rojbûnan de destûra xwarina şîraniyê heye. Ji kerema xwe re nehêlin zarokên we, bi xwe re şekirê lolîtop, benîşt/ qajik û paste/kulîçeyan bînin dibistanê.

Tiştên wendabûyî:

Li dibistanê her tim kincên zarokan li derekê tên dîtin. Heger tiştek hatibe wendakirin/ jibîrkirin hûn dikarin di sandoqa mezin ya li hember serkreteryayê de bîbînin.

Perestî/ibadet: Bi hevkariya Dêra Katolîk (Dilê pîroz) û Dêra Evangelîk (Bartholomew) bi awayekî rêkûpêk xizmetên xweşbînî û hevkariya di navbera olan/dîn de jî tên kirin. Ji bo zarokên nû dest bi dibistanê dikin, xizmeta danasînê, xizmeta Noel û ji bona zarokên pola çaran xizmeta olî a dawîn tê kirin.

Ji bilî van jî ji mehê/heyvê carekê roja çarşemê ji bo polên 3. û 4. zarokên ku tev li dersa olî dibin, di saeta yekemîn de xizmeta dibistanê a olî tê kirin.

Spartek: Spartek ji bo di dersan de kûrbûn û hîndariyan tê çêkirin. Ji bo pola 1/2 an rojane 30 deqe (nîv saet) û ji bo pola 3/4 an jî rojê, 60 deqe (saetek) wek konsantreyê xebat tê kirin.

Malper: Hûn dikarin malpera înternetê li ser vê navnîşanê bibînin:

www.froelenbergschule.de

- Agahiyên zêdetir, di derbarê dibistanê de
- Di derbarê xebatkarên me de
- Di derbarê pol û dersên kesane de
- Di derbarê bûyerên rojane de
- Di derbarê komel û xebatên wê de
- Bi giştî dem û mêjûyên hemû xebatan

Agahî: Ji bo rewşên lezgîn/acîl, bikaribe bi we re têkilî bê danîn, divê bêyî hejmara telefona we, hejmara telefona keseke/î din, mirov an nasê we jî hûn bidin dibistanê (mamosteyên polê)
Heger hejmara telefona we bê guhertin, ji keram xwe re hejmara nû bidin me.
Dîsa di rewşa pirsgirêkên tenduristiyê de (alerjî, derman ûwd.) me agadar bikin da ku em bikaribin rewşê bizanibin û ji zarokên we re bibin alîkar.

Spî: Têkiliya spîyan bi paqijiyê re nîne. Hûn dikarin, bi wan re têkoşînê bikin, xwe û zarokên xwe bi hêsanî ji spîyan biparêzin. Heger spî an rişk ketibe serê zarokên we, ji kerema xwe re ji bo pêşgirîyê dibistanê agahdar bikin. Heta doktor destûrê nede, ji kerema xwe re zarokên xwe neşînin dibistanê.

Nexweşî: Ji ber xeterîya/rîzîko hinek nexweşiyan kêmtir bibe, û zarok ji hev bi nexweşiyan nekevin, divê demekê naçin dibistanê. Ev rewş li gorî zagona Desthilatdariya Federal tê destnîşankirin. Heger rewşek gumanbar/gumanê hebe, ji kerema xwe re ji mamosteyên polê bipirsin. Di derheqê/ nexweşiyên zarokan de mamosteyên wan agahdar bikin, da ku bikaribin di hin rewşan de hinek bergiriyan/tedbîran bigirin. Wek mînak di rewşa ducaniya hevpîşeyeke me de.

Hevkarî:

Komeleya Piştgiriyê:

Li dibistana (xwendegeh) Frölenbergschule, gelek malbat bûne endamên Komeleya Piştgiriyê, hevkarî û piştgiriya/ destek xebatan dikin. Heger ev bala we dikişîne û hûn jî dixwazin piştgiriyê bikin, ji kerema xwe re bi mamosteyên polê an jî Buroya Dibistanê re têkevin têkiliyê.

Sazkarî: Em di xebatên sazkariya jiyana dibistanê de ji beşdariya/ tevlêbûna malbatan ya çalak/aktîf kêfxweş in.

Bêyî saziyên zagonî/qanûnî, organên din jî (pol, berpirsiyarên dê û bavan yên dibistanê û konferansa dibistanê) gelek derfetên tevlêbûna çalakiyên pol û dibistanê hene. Heger dîtin/nerîn/raman û pêşniyarên we hebin, wan bi mamosteyên polan re biaxivin. Em ji dîtin û pêşniyarên we re vekirî ne.

Dersa zimanê dayikê:

Li Dibistana Frölenbergschule bi gelemperî, paralelî dersa olî/dînî, dersa zimanê dayikê ya „tirkî" tê pêşkêşkirin. Ji bona dersên zimanê dayikê yên dinê jî dikare zarok li dibistanên din jî bên qeydkirin. Li wan dibistanan dersên zimanê dayikê dikare piştî nîvroj jî bên dayin.

Bernameya/programa Dibistanê:

Her dibistan, di nava demê de profîla xwe ya dibistanê ava dike. Dibistan xebatên xwe yên girîng û naveroka wan xebatan destnîşan dikin. Di amadekirina bernameyan de dibistan, xwendekar, dayik û bav jî ji bo alîkarî û tevlêbûnê tên teşwîqkirin. Pêşxistina berdewamiya bernameya me ya dibistanê girîng e û bi taybetî jî ji bo destek kirina rêgezên/qaîde dibistanê tevlêbûn û hevkariya we hewce ye. Bernameya me ya dibistanê ya rojane li cem/ba sekreteryayê amade ye.

Rêgezên dibistanê:

Li Dibistana me, Frölenberg- schule, rêgezên dibistanê yên jêrîn pejirandine/qebûl kirine:

Rêgezên me ên Dibistanê

1. Ez li hember kes/mirovên din **dilovan** û **rêzdar** im.
2. Ez kesî **aciz nakim**.
3. „**Stopp**" hat gotin, ez **radiwestim**!

Ji ber vê yekê ...

Li baxçeyê dibistanê ...

- Ez li baxçe/hewşa dibistanê dimînîm û dernakevim der.
- Ben (şerît) tenê ji bo lîstika xwehilavêtinê ne.
- Ez tiştan navêjim (qirş û qal, kevir, gogên berfê/befirê ûwd.)
- Ez tenê bi alavên lîstikê li cihê wê hildiperikim.
- Pêgog/Fußball tenê li qada pêgogê tê lîstin.
- Ez li gorî plana pêgogê tevdigerim.

Li korîdorê ...

- Ez li aliyê rastê, bêdeng û hêdî dimeşim.
- Korîdor (salon) ne cihê/qada lîstikê ye.
- Ez li ser tenîştekên nêrdewan ûwd. xwe naşemtînim/xij nakim.
- Ez çakêt û kincên xwe ên din dadiliqînim.

Li tuwaletan ...

- Ez tuwaletê paqij digirim/dihêlim.
- Ez destên xwe dişom.

- Tuwalet ne cihê lîstikê ye.

Berî destpêka dersê ...

- Saet ji 7.40 î û pêyve mamosteyên çavdêr destûr didin ku ez têkevim polê.
- Piştî bêhnvedana hewşê, dema zengilê yekem lêda/lêxist, ez bi xwe û bi bêdengî diçim polê.

- Berî saet/dersa duyemîn, ez li cihê xwe li ser pêya, bêdeng dipêm, heta ku mamosteya/ê min bê û min bigire/bibe.

Ji bo xwarin û vexwarinê ...

- Di dersê de tenê dema navbera xebatê dikare av bê vexwarin.
- Qurtek/hinek av tê vexwarin û divê dîsa şûşe têkeve hundirê çente.
- Di navbera taştê de ez li ser rûnişteka xwe rûdinim û xwarina xwe dixwim. An ez dikarim bixwînim an jî bi dengê hêdî biaxivim.
- Di bêhnvedanê (Pause) navberê de derfet heye ku ez hinek tiştekî bixwim û vexwim.
- Tiştên şîranî, awarte tenê di (Rojbûnan) de dikarim bi xwe re bînim dibistanê.
- Benîşt/qajik û şekirê lolî li dibistanê qedexe ne.
- Di navbera bêhnvedanê hewşa dibistanê de ez xwarin û vexwarinê nabim derî (hewşê).

Her wiha/wekî din:

- Ez tenê di deriyên dibistanê yên hewşê re der têm û diçim.
- Di bêhnvedana dema baranê de, ez li polê dimînim, li wir dikarim, taştê bixwim, bi pêlîstokan bilizîm an jî bi alavên dersê yên belaş mijûl bibim.
- Heger di navbera dersê de ku ez biçim tuwaletê, ez pêlîstokeke heywane li şûna xwe datînim. Li pola înglîzî de ez alekê li şûna xwe datînim. Li salona werzîşê/sporê, di bêhnvedana baranê û li salona civînan (Aula) bi mamosteya/ê xwe têkilî datînim.
- Ez cîhazên elektronîk (wekî telefona destî, saetên biaqil) bi xwe re nabim dibistanê.
- Ez tiştekî nafiroşim zarokên din.
- Ez bi Bottle Flip nalîzim.

Rêya dibistanê: Heta gegaz/mikûn be, zarok bi pêyan (meş) bên dibistanê baştir e. Tevger (meş) û hewa paqij hînbûn/fêrbûnê hêsantir dike. Berî zarokên we bi tenê bi rêya dibistanê de biçin û bên, ji kerema xwe re berê gelek caran di çûn û hatinê de bi wan bin û derên lê xeterî hene nîşan bidin û çavderiya wan bikin. Di rêyek biçûk de jî be, divê li gorî lambe, nîşan, nîşanê xaçerê bi kar bînin û bala wan bikşînin ser rêbazên trafîkê. Divê hûn di rêya çûn û hatina dibistanê de derfet bidin zarokên xwe da ku ew bi xwe, bi tenê jî bikaribin biçin û bên. Di rê de derên/cihên hûn hêj bi zarokên xwe baş ne ewle/bawer in divê hûn hinekî ji dûr de çavderiya wan bikin. Wek dayik û bav hûn dikarin di rêbazên/ qaîde trafîkê de baldar bin û ji bo ewlekariya zarokan alîkariyeke girîng bikin. Ji kerema xwe re li ser bergeha çûyina rêwîtiyê, paşpê park nekin û zarokên xwe her dem ji aliyê rastê de daxînin (daketin). Ji ber ku rêya dibistanê ne di nav çarçoweya berpirsiyariya dibistanê de ye, ev qad ji bo we watedar/girîng û hewcedariyeke, ku hûn

- Ji zarokên xwe daxwaz bikim ku piştî dersê, yekser bên/biçin malê û/an
- Komikên/grûpên zarokan yên wê tev biçin (rêya wan ya dibistanê yek in) bên avakirin û/an
- Piştî dibistanê yekser zarokên xwe ji dibistanê bigirin/bibin.

Serbixwetî: Divê zarokên we di dema pêvajoya dibistanê de, di bikaranîna alavên dibistanê û xebatan de bikaribin bi xwe organîze bikin, serbixe bibin û hînî serbixwebûnê bibin. Di destpêkê de ji bo amadekariya çenteyê dibistanê, qewlikê pênûsan/qeleman ûwd. hûn dikarin bi kontrolkirinê alîkariya wan bikin. Ev hêdî hêdî zarokên we hînî berpirsiyariyên wan dike. Di dû hefteyê yekem yê destpêka dibistanê re divê zarokên we bikaribin bi xwe çakêtên xwe daliqînin û bi tenê/bi serê xwe biçin polê. Her weha, divê hûn zûtir zarokên xwe hînî çûn û hatina rêya dibistanê bikin da ku bikaribin hêdî hêdî xwe bi xwe biparêzin.

Dersa avjenîyê: Li dibistana me dersa avjeniyê di nava çarçoweya dersa werzîşê/sporê de û wek parçeyekî wê di pola sêyemîn de tê dayin/destpêkirin û li gorî wê asta avjeniya zarokan tê destnîşankirin. Her weha zarok/xwendekar nîşaneyê avjeniyê wek parçeyekî dersa avjeniyê distînin/digirn. Ji kerema xwe re jibîr nekin, di demên avjeniyê yên rojên sar de, serpêç/kumekî bidin zarokên xwe.

Dersa werzîşê/ sporê: Divê di roja dersa wezîşê de kincên/cilên zarokan yên lixwekirin û jixwekirina wan hêsan bin. Dîsa di heman rojê de divê tiştên xemlê jî tune bin. Ji kerema xwe re bendikên por/pirçê jî jibîr

nekin. Ji bo zarokên ku nikaribin bi xwe bendikên pêlavên/solên xwe girêbidin, divê pêlavên bê bendik/qeytan di pê bikin.

Plana saetên dersê: Guhertinên plannekirî tunebin (wek nexweşiya mamosteyan ûwd.) bêyî ku berê hûn bên agahdarkirin, em zarokên we naşînin malê. Ji bo dersên temamkirinê an cîgir heke dirêj berdewam bikin, di dereheqê guhertina plana saetên dersê de hûn ê bi nivîskî bêne agahdar kirin. Yanî wê ji we re name bê şandin. Heke zarokên we li dibistana tevahiya rojê (OGS) bin an di saetên din yên lênerînê de bin, wê wek herdem bîmînin.

Hawîrdor: Di rêya çûn û hatina dibistanê de bi hişmendî û berpirsiyariya hawîrdorê/derdorê û di bikaranîna çavkaniyan de tevgerîn gelekî girîng e. Zarok li dibistanê di nava Komxebatan (AG) de hînî sexberî/teserûfa cureyên vejenê (enerjî) dibin. Wek nimûne, zarok bi hin şanekên (şikil) ku wan bi xwe çêkirine/amade kirine, têdigihêjin ku dema hewcedariyê ewên, ronahiyê /lambeyan vekin.

Bêyî van li ser teserûfa avê û li ser pêwîstiya hudir hewadarkirinê jî di xalên girîng de bi tevahî agahî tên dayin. Ji kerema xwe dema hûn ji zarokên xwe re alavên dibistanê wek lênûsk/defter, qewlik ûwd. dikirin, haj jê hebin, bila yên kaxezî û yên din ku xisarê nadin hawîrdorê bin. Dîsa qutîkên ku hûn taştêya zarokan dixine, bila ne yên ji bo yek carekê yên mirov dikare her car bikarbînin bin. Li dibistana me cihê pîl/batarîyên kevn û qutîkên hibira çapkarê (Drucker) yên vala hene.

Dema/saetên dersê:

1. (saeta yekem)	Saet, 7.55 – 8.40
2.	Saet, 8.45 – 9.30
Bêhnvedana Hewşê	Saet, 9.30 – 9.50
Bêhnvedana Taştê	Saet, 9.50 – 10.00
3.	Saet, 10.00 – 10.45
4.	Saet, 10.50 – 11.35
Bêhnvedana Hewşê	Saet, 11.35 – 11.50
5.	Saet, 11.50 – 12.35
6.	Saet, 12.40 – 13.25

Dabîn/sîgorta: Li ser rêya dibistanê û di nava demên li dibistanê de xwendekar/şagirt ji aliyê Qaseya Qezayê a sîgortaya Bakurê Rena Westfalya a xwediyê dibistanan de sîgortakirî ne. Ev dabîn/ sîgorta ji bo hemû çalakiyên dibistanê ne. Dema ku di rêya dibistanê de qezayek biqewime divê Serkeretiyata Dibistanê di derbarê vê de bê agahdarkirin.

Karne/karname: Di dawiya sala perwedê de ji bo şagirtên pola 1 û 2 an hînbûn û rêjeya/derece serkevtina wan a kesane, wek raporek berfireh tê nivîsandin. Dîsa di karneyê de rewşa şagirtan a xebatê û tevgera wan a civakî de jî agahî tên nivîsîn. Di pola 3. û 4. de ji bo her dû nîvsalên perwerdê jî cihê cihê karne tên amadekirin. Di pola

sêyemîn de wek not jî asta zarokran bi hejmar jî tê nivîsîn. Di pola çaran de jî karne tevî notan tê dayin. Her weha di dawiya pola 4 çaran de ji bo Dibistana Navîn nameyeke pêşniyarî jî tê nivîsîn û li gorî asta zarokan tê pêşniyarkirin ku biçin kîjan cure dibistanê wê ji bo wan baştir bibe.

Heke yek (mirovek) te mezin û yeka/î din jî te piçûk bibîne, wê demê dibe ku tu rast î.

Astrid Lindgren